

JAG
VILL
VETA

EZ DIXWAZIM BIZANIM

- JI ZARROKÊ XWE
RE ÇI BÊJIM?


Agahî ji bû dêûbavê ku zarrokên
wan bi agahîyên parastî dijîn

Destpêkî	5
Agahîyên şexsî yê parastî	6
Zarrokên bi agahîyên şexsî yê parastî	7
Mafê zarrokan	8
Zarrok çî dibêjin	9
Ji zarrokan re çî bêjim	11
Xatir xwastin û Xwatir gotin	13
amadekarîya dij bi metirsîya	14
maweya ku zarrok zexim dibe	15
Pêwendî girtin gel xelkê û civakî bûn	17
alîkarî wergirtin ji kesên dî	18
Agahîyên bêhtir bi rêya malpera	
Brottsoffermyndigheten	19

NAVERROK



DESTPÊKÎ



Zarrok di agahîyên ser rewşa xwe, girêdayî bi mezina ne. Ji ber vê ev belavoke li alîyê Brottoffermyndigheten ji bo dêûbavê zarroka hatîye amadekirin Di ev belavokê da, hûn wek dêûbav, hinek pêşnîyaran liser asantir kirina jîyana zarrokên xwe yê ku agahîyên wan hatine parastin, werbigrin . Ev belavoke bi alîkarîya Barnombudsmannen hatîye berhev kirin

Di Swêdê da nêzî 4,000 zarrok û kêmsal hene ku bi agahîyên şexsî yê parastî dijîn. Gelek zarrok ji parastina agahîyên xwe yê şexsî mifa werdigrin, ji ber ku dêûbav anku yek ji wan rastî şidet anku metirsîyê hatine. Bê berçav girtina vê yekê ku zarrok bi xwe rastî şidet anku metirsîyê hatine, agahîyên wan yê şexsî , jîyana wan dêxe ber bandora xwe.

AGAHÎYÊN WAN YÊ ŞEXSÎ

Astên cûda yê parastinê hene. Ji bo hin kesa tenê parastina demî pêdivîye lê ji bo hin kesên di pêdivîye ku heta dawîya jîyana wan agahîyên şexsî yê qelp bêne pêşkêş kirin.

- Parastina agahîyê şexsî bi vê wateyê ye ku di rêxistina qeyda nifûsê da îşaretek bernavê wan heye ku nişan dide ku nabe agahîyên wî şexsî bê vekolînên taybet bêne parvekirin Pêvajoya parastina agahîyê şexsî du sal carek tê venêrîn kirin.

- Di berdewam bûna qeyd kirina agahîyên kesê wisa da, her kesê ku tê tirsandin, ji şûnek nû re tê veguhastin, lê nişaniya wî ya pêş li pergalê da her qeyd kirî dimîne û nameyê xwe bi rêya şandina wan ji rêxistina baçê werdigre .

- Agahîyên şexsî yê qelp asta herî bilind ya parastinê ye ku gengaze ji kesek re bê dabîn kirin û bi wateya vê ye ku kesayetî, nav û hejmara nasnameyek nû tê ji were bê pêşkêş kirin .


Gel daxwazker ev parastinê bi rêya rêxistina baçê werdigrin, lê hin kes evê bi rêyd pêwendîya gel polîsan bi dest tînin.

On **www.skatteverket.se** hûn bi serdana ev malperê dikarin daxwaza xwe ji bo wergirtina parastina agahîyên şexsî pêşkêş biken. Herwisa dikarin pêwendî bigrin.

0771-567 567.

ZARROKÊN KU AGA- HÎYÊN WAN YÊ ŞEXSÎ TÊNE PARASTIN

Bi giştî ji ber rewşa dêûbavê zarroka, agahîyên wan yê şexsî têne parastin. Dêûbav bo mînak ji ber karê xwe anku bi sedema şahidîya di dadgehê, dikevîne ber metirsîyê. Sedema ku bi piranî tê dîtîn, şideta malbatî ye, dema ku metirsî ji alîyê yek ji endamê malbatê anku xizmekê derdikeve holê. Herwisa gengaze, zarrok ji alîyê dayik yan bav yan herdu anku ji alîyê komek ji xizmê xwe bikeve ber metirsîyê.



MAFÊ ZARROKAN

Konvensiyona Mafê Zarrokan, peymanek navnetewîye ku Swêd ji yek ji endamê vê ye. Ev Konvensiyone bê berçav girtina cinsiyet, regez, ol anku kêmasiyên leşî, liser mafên zarroka dixebite. Ji ber ku gengazîya zirrarrê ji zarrokan re zêdetire, pêwîste ku bi taybetî bêne xwedî kirin û parastin.

KONVENSİYONA MAFÊ ZARROKAN

Li ser çar prensîpa rawestayê:

- mafê gişt zarrokan wekhev e
- dibe di gişt biryarran da berjewendiyên zarrokan bêne berçav girtin
- mafê her zarrokekê ye ku bijît û mezin bibît
- dibe ku gişt zarrokan mafê biryardanê hebe û rêz ji biryara wan b, girtin.

Ligor CRC zarrokan maf heye ku li hember hemû cûre şidetên fizîkî, yan derûnî, lêxwedî derneketin û şideta seksî bêne parastin.

Herwisa Konvensiyona dupat diket ku dibe zarrok, ber metirsîyê bêne parastin.

Hemû zarrokan maf hene ku zarrokatîya xwe bê tûndî derbas biken. Dema ku di malbatê da zarrok anku yek ji endamê mala wan rastî şideta tîn, wan mafê parastin û ewlehbûnê hene.-Armanca parastina agahîyê şexsî, dabîn kirina parastinê ji bo zarroka ne ku rastî şidetek zêdetir neyên. Dema ku malbatek dikeve bin parastina agahîyê şexsî, zarrok heye eger temenê wan kême be ji mafê wane ku di bernameya da beşdar bin û ji bûyeran agadar bin. Eve dibe sedema zêdebûna berpirsîya dêûbava. Çi ji zarrokan re bêjin? Çi qas zarrok ji mijarê têdigehin? Çawa em dikarin berî li tirsar zarroka bigrin?

ZARROK ÇI DIBÊJIN?

Ji zarrokan re jîyana bi metirsî diware û gelek ji wan ditirsin û hesta metirsîyê hene. Parastina agahîyê sexsî, ewlehî ye ke ku ev tirsê kê m dike.

»DI DESTPÊKÊ DA, XELAS BÛN JI EV TIRSÊ GELEK DIJWARE. ŞEWA MIN QET NEDIKARÎ KU EZ RAZÊM. BI RASTÎ MIJAREK PIR DIJWAR BÛ.«

Ebba¹

»EZ BI HEBÛNA KESAYETÎYA PARASTÎ, HEST BI PIŞTIRIYÊK BILIND DIKEM. DI RASTÎ DA EZ XWE EWLEH DIZANIM. HEST BI JÎYANA EWLEH TECRÛBEYÊK PIR XWEŞE.«

Rebecka¹

Gengaze ku agahîyê parastî bibine sedema alozîyê mezin bi taybet dema ku zarrok mezin dibin. Hesta gelek zarroka eve ku nizanin liser ev mijarê ji zarrokê xwe re çî bêjin. Zanîna vê ku çî tiştek ji hevalên xwe re dema ku ev bû listikê têne mala wan, bêjin mijarek diware. Gelek ji zarrok ku bi agahîyên parastî dijîn tûşî nerihetîya tenêbûnê dibin û ev zarrokene, ditirsin ku kesayetîya wan aşkere be.

»EZ HEZ NAKEM KU GELEK DEMÊ GEL HEVALÊN XWE DERBAS KEM LIBER KU NAXWAZIM PIRSAN JI MIN BIKEN. EV MIJARÊ BANDORK XIRAB LISER MIN XIST«

Sofia¹



Zarrok û Kêmsal bi pirranî wisa difikirin ku kesê mezin di dibistanê, di xizmetên tendiristîyê û desthilatdarên dî agahî liser ev mijarê nînin ku jîyana bi agahîyên parastî, mirov rastî ci astengîya dike.

**»Û PAŞÊ EV ZARROK DIKEVINE
DIBISTANÊ. WISA XÛYA YE KU EV
DIBISTANENE QET AGAHÎ LISER EV
MIJARÊ NÎNIN.«**

William¹

¹ Di ev belavokê da hemû gotinên jêwergiran ji rapora Barnombudsmannens hatine iqtibas kirin

JI ZARROKAN RE ÇI BÊJIN

Zanîna vê yekê ku ji zarrokan re ci qas agahî bê dayin, mijarek diware û pêşniyarek giştî di ev mijarê da tûne. Ev ku bi şexsî ji zarrokan re çi agahî bêne dan girdayî ye bi rewşa wan, lê hinek mijar hene ku dibe berçavan da derbas bin:

Bixwe gel zarroka biaxivin. Demek taybet ji zarrokan re dabîn biken daku hûn bikarin bûyeran ji wan re zelal biken. Zarrok bi asanî têdigihin ku dêûbav tûşî tirs û diltirsîyê bûne û bi giştî guhdarîya axavtinê mezinan gel hev, diken. Eger kes liser mijarê gel wan neaxivî, gelek gengaze ku ew bi xwe ji bûyerê agadar bin. Heya gengaze ku ew tûşî tirs, şik û tenêtiyek zêdetir bibin. Bigiştî gotina mijarê dibe sedema piştrastîyê.

Liser serpehatîyê zarrokan bipeyivîn. Dema ku zarrok, metirsî anku tirsê tecrûbe diken, bi giştî gelek liser ev mijara difikirin. Peyivîna gel kesê mezin dibe sedema piştrast bûna zarrokan û alîkarîya wan dike ku serpehatîyê xwe gel kesên dî parve biken Herwisa, ev firsenda pirsîna pirsê xwe peyda diken. Eger zarrokek rastî şidetê hat anku bi çavê xwe tûndî û metirsî dit, baştîre ku jê re bêjin ku biçe cihek ewlehtir. Mafê zarrokane ku bizanin hemberf metirsîya tê bêne parastin .

- Niha em cihê xwe diguherin û liser cihê jîyana xwe ya nû gel Henrik napeyivîn, daku ev nekaribe me peyda bike û disa dij bi me şidetê bikar bîne.

- Min gel hinek kesê mezin alozî hebûye liber wê ez naxwazim ku ev werin mala me. Ji ber wê em ji çî kesekî re nabêjin ku ji kû da diçin.

Naverrokên metirsîdar nebêjin. Naverrokên şideta anku metirsîyê ku haya zarrok pê tune, nebêjin. Dibe ku ev kare metirs'dar be. Lê, agahîyên pêwîst dibe ji zarrokan re bêne pêşkêş kirin daku bizanin ku nabe ji çî kesî re nîşanîya cihê jîyana xwe biden .

Derewa neken. Hinek daran pêwîste ku hûn zarrokan ji bûyerê metirsîdar biparêzin, lê temenê zarrokan bo têgehîştina ev mijara ne gelek kême. Li bîr neben ku zarrok mezin dibin. Dema ku zarrok mezin dibin, mafê wane ku zêdetir bizanin. Di vê demê da eger derewek ji wan re hatibe gotin, dibe sedema astengîyek dijar. Gengazîya ev rîskê heye ku ew bêhêvî bin û bifikirin ku lêb li wan hatîye kirin. Di şûn da, pişkek ji mijarê bêjin û tevî ku zarrok mezin dibin agahîyên berfirehtir ji wan re biden.

Zarrok biparêzin, xênjî vê zarok ji we naparêze. Pirranîya zarrokan asayîyê dixwazin û piştgirîya dêûbavê xwe diken. Ev mijare, berpirsîyek mezine ji zarrokan re. Piştrast bin ku kesek heye ku hûn bikarin diltirsîya xwe gel wî parvebiken.

Zarroka li hember "peyvînên mezina" biparêze. Dema ku hûn gel kesek mezin liser serpêhatîyên metirsî û şideta dij xwe dipeyîvî, piştrast be ku zarrok gotinê we nabihîze . Eger zarrok bê ku naveroka bûyerê bizane û yan firsenda pirsîna pirsan liser mijarê tune be, dibe ku mijar ji zarrok re bizirar be.

XATIR XWASTIN

Pêdivîye ku zarrok di bûyerê jîyanê da beşdar be. Dema ku hûn cihê xwe diguherrin, dibe ku zarrok pêştir agadarî ev mijarê bibin û xwe amade kiribin. Eger firsenda we hebe, baştire ku hûn ji karê xwe bênvadanê bigrin û ji heval, çîran, baxçeya zarroka û lîstikgeha zarroka xatirê xwe bixwazin.

Dema ku mal di bin revê da ye û dikeve bin bernameya parastina agahiyên şexsî, gengaze ku rewş wisa be ku firsenda bênvadan û xatir xwastinê tune be. Hinek caran, negengaze ku hûn bikarin serdana cihê zarrokan biken û gengaze ku hûn mecbûr bin ku pêwendiyê xwe gel heval, baxçeyê zarrokan û malbatê qut biken . Dibe ku ev kare, bijare herî baş nebe ji zarrokan re, lê hinek caran, çî bijarê dî nînin. Hertim ewlehîya we û zarrokên we balkêşe .

Bixebitin amûrên ku ji zarrokê were balkêşin, gel xwe raken. Karek başe eger hûn bikarin amûrên we pêlîstank, pirtûk, cil û amûrên dî yê malê ku ji bo zarrok balkeşin, dema ku hûna mala xwe bar diken gel xwe raken. Wêneyên malbatî ji bi pirranî giringin. Carna hûn dikarin bizivirin û serdana dilovanîyê xwe biken.

Eger pêwendîya we gel heval yan malbata we nîne, baştire ku dîyarîyên wek wêne, qeyda denga û tîştê wisa ku hevparin, peyda biken Ev tiştê dikare ji zarrokan re jî alîkar be.

Eger gengaz be bênvadanê bigrin. Eger gengazîya pêwendîya ewleh gel baxçeyê zarrokan heye, fikrek başe ku hûn daxwaz biken ku gel zarok silav û halpîrsînek bê kirin. Qeydê denga yan vîdeoyên gel hevalan û mamoste anku nigar û wêneyên pêwendîdar dikarin gel ji zarrok re bi wate bin.

BERNAMEYEK JI BO HEMBERA GEL METIRÎYA

Dema ku zarrok anku endamek malbatê rastî metirsîyê tê, pêwîste ku ji bo hemberîya gel bûyerê bernameyek bê amade kirin . Jinge ha çawa dikare di ev mijarê da amade be? Zarrok ji bo pêşkêş kirina alîkarîyê dikare çi bike?

Gelek dibistan û baxçeyên zarroka bernameyên taybet ji bo zarrokên ku agahîyê wan yê şexsî parastî ne, berhev diken. Dema ku hûn liser metirsîyê ku zarrok lihember hatîy parastin dinivîsin dibe hûn ev mijara ne qeyd biken ku, dibe kê agadar be ku agahîyê zarrok yê şexsî parastî ne, li kû zarrok pêdivî bi alîkarîyê zêdetir heye û gişt naverrokên praktîk liser çawanîya pêk anîna ev kiryarane. Eger dibistan anku baxçeya zarroka haya wan ji we agahîya ne tûnebe, ji wan re pêşkêş bike!

on www.skolverket.se bernameyên perwerdehîyê taybet zarrokên ku agahîyên wan yê şexsî parastî ne, hene .” Bo minak, hûn dikarin liser rewşa xwe gel heval û cîranê xwe bipeyivîn. Ev metirsîye heye ku kesê ku agadarî mijarê dibin, vê ji kesê di re bêjin, lê kesê di jî ku agadarî mijarê dibin jî dikarin ji we biparêzin Bi giştî hûn dikarin bi qasa pêwîst agahîyan ji kesê di re rabigehînin daku eger pirsgirêkek metirsîdar hate pêş alîkarîya we biken, lê gişt bûyerê ji wan re nebêjin û herwisa ev rastîyê ku hûn bi agahîyên şexsî yê parastî dijîn ji wan re nebêjin. Bo minak ji cîranê xwe re bêjin ku eger di mala ve da da dengê qîjên anku şer bihîztin, gel polîsan pêwendîyê bigrin.

Eger zarrok nasnameya xwe zelal kir. Gengaze ku zarrokê we xwe ji bîr bibe û cihê jîyana xwe aşkere bike. Herwisa gengaze zarrok bo aşkere kirina cihê jîyana xwe rastî şidetê bê. Sedem çî be, balkeşe ku nabe hûn zarrok ji ber gotina agahîya tawanbar biken. Heya eger ev kare bibe sedema metirsa malbatê û di encam da mal bê guhertin, nabe hûn zar-

rok tawanbar bizanin. Gel zarrokê xwe bipeyvîn û gengazîya bûyerê wisa jêre bêjin û piştras biken ku ev nebûye sedema guhertina avahîyê we. Gele zarrok di rewşek wisa da ku kesek wan tawnabar dike, hesta tawanbarîyê diken. Bi peyvîna liser ev mijarê hûn dikarin ev berpîrsîyê liser milê zarrok rabikin.

TEVÎ KU ZARROK MEZIN DIBE

Asata têgehîştina zarroakn di temenê cûda da mijarek taybete û ji ber wê pir dijaware ku rênasîyek giştî bê pêşkêş kirin û bê dikar kirin ku di çî temenkê da ser rewşa parastina zarrokan jêre çî agahîyan pêşkêş biken . Bê berçav girtina asta têgehîştina zarrok, balkeşe tevî ku zarrok mezin dibe aghaîyên zêdetir jêre bèn pêşkêş kirin ku zarrok bikare gel mercên jîyanê bixebite.

Ji 0 heya3 saliyê: Hertime dibe kesek mezin sal gel zarrok be. Zarrok biparêze û piştrast be ku zarrok ewleh ye. Gel zarrokistanê bipeyive ji amadebûna xebata wan misoger be.

Ji 3 heya6 saliyê Zarrok dest bi pêwendîya gel zarrokên dî û mezinsala dike. Zarrok agahîyê bêhtir liser mijara peyda diken û pêdivî bi agahîyên zêdetir hene.

Zarrok li nav bernameyên amadekarîyê beşdar biken. Liser ev mijarê bifikirin ku hûn dixwazin ku dêûbavê hevalê we liser çi mijara agadar bin.

6 salî û mezintir: Zarrokê ku di temenê xwandinê da ne, berpîrsîyê zêdetir dipejirînin. Dibistan berpîrsîyê nû dêxe ser milê wan û carna dibe sedema pêşhatina hinek astengîya. Misoger bin ku bernameyek heye û her nîvsala xwandinê ev bername biroj dibe. Pirrana xebatê zarrokan xebatê lîstinê ne. Ev diçine cem hevalê xwe û şewê di derweyê malê derbas diken. Liser zarrokên we? Haya kê tê liser mijarê hebe? Zarrok dikare çi mijaran gel kesê di parve bike?

Mezin bûn wek nûciwanek ê

Dema ku zarrok digehîje temenê nûciwanek ê, pêwîstiya wan bi zanîn, beşdarî û pişkdarî di biryar girtinê, gelek berfirehtir dibe. Dibe ku nûciwan liser heval û hawrêyê kiç, hawrêyê kur, bênedan û xwandinê biryarra xwe bigre . Nûciwanên ku agahîyên wan yê şexsî hatine parastin bi astengîyê dij-

war re rûbirû dibin û gelek kêma dikarin gel heval û hevtemenê xwe rabêj biken . Kesê ku cem wanin, bi qasek kêrhatî liser ev mijarê agahî çinînin û nizanin ku jîyana bi metirsî pêwîst bi çi merca heye. Gengaze wan heya liser ev mijarê jî agadar nebin ku nûciwan ber metirsîyê ye û agahîyên wî yê şexsî bin parastinê da ne.


Wek dêûbav, rola we gelek balkeşe. Hûn kesekin ku dikarin liser ev mijarê ji zarrok re rabêj biden û ji wan re zelal biken ku çima balkeşe di maweya ku agahîyên wî yê şexsî têne paastin, hişyarî xwe be. Herwisa, hûn kesekin ku dikarin zagon û sînora ji zarok re dîyar biken. Pêwîste ku nûciwan pîrsên xwe bipirse û liser zagonê ku cîbecî kirina wan dijawab hevpeyivîn biken, di xênjî vê, ev metirsî heye ku ev zagonene bi weşartî bê bînpê kirin . Bi hev re, dikarin ev zagona daynên ku ligor rewşa malbata we, zagonê herî başi bin.

Pîrsên balkeş di ev mijarê da wek gel çi kesekê dikare ew mijarê parvebike, çalakîyên sporê û bênedanê, karê zêde, torên civakî û internetê dibe bîne hevpeyivî kirin.

PÊWENDÎYA GEL KESÊN DÎ Û CIVAKÎ BÛN

Pêwendîya gel kesên dî û civakî bûn, pişkek balkeş a jîyana gelek nûciwana ye. Ev demên xwe gel hevalên xwe derbas diken, berpîrsîyê xwe cîbecî diken, mûzîkê guhdar dibin, kêbirkê diken, temaşayî filman diken û kîrînê diken. Lê eger hûn di bin metîrsîyê da bin tor cihêk rîske, ji ber ku dikare kesayetîya we aşkere bike. Gengaze zarokên bi agahîyên parastî wek kesên di torê bikar neyînin û pêdivîye pêş ku bikarin torê bikar bînin, ewlehîya torê hîn bibin. Bi gotînekê dî pêdivî ye ku hûn pêvajoya hîn bûnê zûtir û herîzêde li maweya dibistanê da destpê bikin.





JI XELKÊ ALÎKARÎ WERBIGRE

Hebûna rewşa agahiyên şexsî yê parastî, gûşarek zêde dêxe ser milê gişt endamê malbatê. Eger peyivîna gel zarrok yan bersiv dana pirsê wî, karek diwar e, li derweyê malê, hin alîkarê têne pêşkêş kirin. Ev alîkarîya ne di rewşa ku zarrok xwedî serpêhatîyê xirabe û hê nîşanê metirsiyê liser wî berdewam in jî têne pêşkêş kirin. Pirrana zarroka wisa difikirin ku peyivîna gel kesê bîyanî ku qûla belav nebûna nehîniya wan dide, tiştêk baş e.


Xizmeta tendiristîya dibistanê, xizmeta civakî û xizmeta dabîn kirina rûnişgehê, dikare ji were di peyda kirina navenda rabêjîyê di herema mala we da, alîkarî pêşkêş bike.

AGAHÎYÊ BÊHTIR DIKARIN DI WÎ BARÎ DA LISER MALPERA BROTTSOFFERMYNDIGHETEN BIDEST BÎNIN

bi rêya malpera **www.jagvillveta.se** dikarin agahîyê zarrokên î ku bi agahîyên şexsî yê parastî dijîn, bidest bînin. Herwisa di ev malperê da, agahîyên liser tawana, maf û hûqûq û wergirtina piştgirîya hatine pêşkêş kirin

Malpera **www.brottsoffermyndigheten.se** agahîyên çend zimanî liser mafê cangorîya û pêvajoya zagonî û herwisa agahîyê pêwendîya gel rêxistinê dî yê dewletê û rêxistinê xêrxwaz pêşkêş dike.

Brottsoffermyndigheten tê keyfxweş be ku bersiva pirsên taybet bi çawanîya wergirtina xerameta tawana ji were pêşkêş bike. Gel telefona xizmeta ya berpîrsê pêwendîdar pêwendî bigre **090-70 82 00**, û gel berpîrsê dosyê di pişka xerameta zirarên cezayî da, bipeyivin



BROTTSOFFERMYNDIGHETEN

Box 470, 901 09 Umeå

Tel: 090-70 82 00

registrator@brottsoffermyndigheten.se

www.brottsoffermyndigheten.se

www.rattegangsskolan.se

www.jagvillveta.se